

BELÊ, HÊJA YE, KU MIROV JI BO QEREBAXÊ BINIVÊJE, LÊ...

Di navbera ermenîyan û azerbaycanîyan da jinûva agirbest hate t'er'ibandin, jinûva di navbera hêzên wan da p'evçûnên leşkerî pêk hatin – sedema wê jî dîsa heman pirs bû – pirs Qerebaxê...

Jinûva li ser asta navnet'ewî dîsa di derbarê wê da hate gotin, ku ji bo ç'areserîya pirsê divê bi hev r'a bi zimanê leşkerî neaxivin...

Ji bo ç'areserkirina pirsê R'ûsîya jî k'ete nava t'evgerê. R'êvebisrîya R'ûsîyayê dîyar kir, ku ew amede ne, bi çalak beşdarî pêvejoya ç'areserkirina pirsgirêka Qerebaxê bibin...

Nûnerên R'ûsîyayê yên p'ayabilind (serokwezîr Mêdvêdêv û wezîrê k'arên derva Lavrov) çûn Yêrêvanê û Bak'ûyê... Bi hewlên wa herdu alîyan agirbest r'agîhandin.

Nûnerên R'ûsîyayê daxwîyandin, ku ew amade ne, ji vir û pêva jî ji bo bi aşî ç'areserkirina pirsgirêkê r'êyan biger'in. Lê... dîsa di nav vê govekê da, hîç p'eyvek di derbarê pirsgirêka k'urdî da nehat gotin...

Em li hinek materialên di derbarê vê pirsê da ger'yan, ku di nav wan da hîç nebe di nava vê çarçoveyê da, tiştek di derbarê pirsgirêka k'urdî da jî hebe...

Em lê ger'yan û matêrialên balk'êş ên deh sal berê k'etin ber destê me...

Û, weha, dertê holê, ku wê demê, deh sal berê jî, hinek hewldan hebûne, ji bo ku bi awayekî wê pirsê ç'areser bikin. Dertê hole, ku wê demê jî di hêmanên r'agîhandina gurseyî da bi çalak pirs danûstandinên dualî (dialog) yên di navbera Ermenîstanê û T'irkîyayê da hatine govtûgokirin, û mijara wan hevdtînan jî pirs başkirina p'êwendîyên dualî bûye.

Helbet, di nav wan danûstandinan da awazê pirs Qerebaxê her hebûye.

Belê, li ser astên cuda çend hevdtînan nûnerên wan herdu alîyan pêk hatine. Di encamê da di gelek pirsan da nêr'inên Ankarayê û Yêrêvanê nêzîkî hev bûne û, ya sereke, ew gihîştine têgihîştina wê, ku divê di pêvajoya ç'areserkirina pirsê da dîplomasîya “gavên biç'ûk” bê bik'aranîn. Û gava yekem a li ser wê r'êya p'ir' diwar jî, ç'areserkirina pirs vekirina sînore di navbera T'irkîyayê û Ermenîstanê da bûye.

Wê demê hêvî hebûye, ku p'êwendîyên di navbera Ermenîstanê û T'irkîyayê da dê germ bibin. Heya wezîrê k'arên derva yê T'irkîyayê yê wê demê Alî Babacan nêr'îna xwe anbû zimên, ku “başkirina p'êwendîyên Ermenîstanê û T'irkîyayê t'u demê ewqas nêzîk nînbûye”. Heya ewî gotibû, ku, her çiqas, ewana negihîştine hevr'ûniştinekê jî, lê p'ir' nêzîkî wê ne.

Lê wê demê r'ikberên r'êvebirîya Ermenîstanê gotibûn, berî ku hinek p'êwendîyên dîplomasî bên danîn, di sêrî da T'irkîya divê t'evkujîya ermenîyan a salên 1896–1915-an di Împêratorîya Osmanî da xwemikur' bê û bip'ejirîne.

Û di heman demê da t'erefê Adirbêcanê jî li ser vê pirsê xwedî dtîneke cuda bûye. Bi nêr'îna t'erefê Adirbêcanê, mifteya hevdtînan û danûstandinên Ermenîstanê û T'irkîyayê divê pirsgirêka Qerebaxê be.

Wê demê wisa jî hatibû gotin, ku Ankarayê û Yêrêvanê di wî warî da gavek a girîng avîtine, lêbelê, hê jî ji bo ku ew bikaribin hev r'ûnîn, hê hinek pirsgirêkên girîng mane. Ku yek ji wan pirsan jî ew e, k'a çawa Bak'ûyê bidin bawerkirin, ku pêwîstîya p'êwendîyên wî r'engî hene.

Ûnal Çêvîkyozê cîgirê Wezîrê k'arên derva yê T'irkîyayê yê wê demê û baylozê T'irkîyayê yê demekê di Adirbêcanê da, dema li Amêrikayê bûye, nêr'îna xwe ya li ser helwesta Adirbêcanê li hember vê pirsgirêkê anîbûye zimên: “Adirbêcan cînara me ya here nêzîk e di vê herêmê da, û ew bi baldarî li p'êwendîyên T'irkîyayê û Ermenîstanê dişopîne. Ji hêla dinê va di navbera Ermenîstanê û Adirbêcanê da pirsgirêka Qerebaxa Ç'îyayî hê nehatye ç'areserin. Û, xwezayî ye, ku Adirbêcan bi baldariyek wisa mezin wan pêvajoyan dişopîne. Lê t'u sedem ji bo net'avetî û gumanên Adirbêcanê t'unene. Helwesta T'irkîyayê ya li hember pirsgirêka Qerebaxê, – dîplomate t'irk gotina xwe

didomîne, – dîsa wek berê ye, û di vê pirsê da t’u guhar’tin nînin. T’u guman nîne, ku pêvejoya başkirina p’êwendîyên T’irkîyayê û Ermenîstanê û pêvejoya ç’areserkirina pirsgirêka Qerebaxa Ç’îyayî bi hev r’a dimeşin”. – Bi van gotinan dîplomatê t’irk axavtina xwe bi dawî kiribûye.

Lê wê demê di Bak’ûyê da gotine, ku herdu pêvajo nikarin bi hev r’a bimeşin, ku başkirina p’êwendîyên di navbera T’irkîyayê û Ermenîstanê da divê her piştî ç’areserkirina pirsgirêka Qerebaxê pêk bê...

Û, wek ku bûyerên vê dawîyê didin xuyan, helwesata t’irkî-adirbêcanî ya li hember pirsê Qerebaxê hê jî ew maye...

Belê, îro, weke wê demê, pirsgirêka Qerebaxê di r’ojeva hevdîtînên navnet’ewî da ye, û dibe ku ewê bandor’a xwe li ser pêşveçûnên p’êwendîyên wan dewletan ên pêşer’ojê jî bihêle.

Û, ji ber wê jî, xwezayî ye, ku ewê ji bo ç’areserkirina wê pirsgirêka baş hewl bidin.

Wek ku tê xuyan, dewletên herêmê û dewletên gewre yên cîhanê, dema dixwazin pirsgirêka Qerebaxê ç’areser bikin, ji bîr dikin, ku divê di nav wê ç’arçevê da wisa jî pirsgirêkek a dinê ya ne kêm girîng – pirsê mafên k’urdên wê herêmê – pirsê K’urdîstana Sor jî ç’areser bikin.

Û, divê di sêrî da bê p’ejirandin, ku pirsgirêkek a wisa heye, û ji bo ç’areserkirina wê jî bingeheke dîrokî heye. Û ç’areserîya wê dikare di nava kontêk’sta ç’areserkirina pirsgirêkên herêma Qerebaxê ya giştî da pêk bê.

Gelo çî pirsgirêk e ev? Ji bo ç’areserkirina wê çî bingehên dîrokî hene? Ew çîma her carê hewl didin, ku di derbarê hebûna wê da ji bîr bikin? Ji bo ç’areserkirina wê çî r’ê dikarin hebin?

Dema em ji bo van pirsan bersîvan diger’yan, me di r’ojnameya “K’urdîstana azad” da («Свободный Курдистан» №№ 1/34 û 2/35, sal 2006) matêrîalên balk’êş dîtî. Ew şîroveyên nivîsk’ar û r’ojnamegerê k’urd Korda Mad (Ezîz ê Cewo) bûn, ên bi sernivîsa: “Belê, hêja ye, ku mirov di ser Qerebaxê da binivêje, lê...” û, yek jî, gotara wî bi xwe ya “Aş bi xiyalekê, aşvan bi xiyalekê”, ya ku pêwîstîya ç’areserkirina pirsê bi agahî û danayên dîrokî va xurttir dike.

Em, van matêrîalan bi destûra nivîsk’arê wan r’aberî bala xwendevanên xwe dikin û hêvîdar in, ewê, ji bo ku mirov bikiribe bingeha evê pirsgirêka ewqas ne sade têbigihîje, ji gelek hêlan va bibe alîk’ar.

Û – ew gotar:

Korda Mad:

Belê, hêja ye, ku mirov ji bo Qerebaxê binivêje, lê...

Di r’ojnameya “Moskovskie novosti”(«Московские новости»/“Moscow news”, № 05/1322, 10-16 02. 2005) gotara Nûnerê sîyasî yê Serokk’omarê Fêdêratsîona R’ûsîyayê yê ji bo pirsên Qerebaxa Ç’îyayî yê berê, birêz Vladîmîr Kazîmîrov a “Hêja ye, ku mirov ji bo Qerebaxê binivêje” hatibû weşandin.

Me ji helbestvanê k’urd, pûblîtsîst û r’ojnameger Korda Mad (Ezîz ê Cewo) hîvî kir, ku ew wê gotarê ji bo xwendevanên me şîrove bike, ji ber ku ew hemû bûyer li ber ç’avên wî pêk hatibûn.

Weha, şîroveyên wî:

Ev gotara birêz V. Kazîmîrov a ne zêde mezin bi r’emgekî t’omerî hemû r’êyên ç’areserîya pirsgirêka Qerebaxê tîne zimên. Li vir t’aybetîyên pisporî yên xudanê gotarê wek sîyasetmeder û dîplomat dertên ber ç’avan – di k’arê r’avekirina pirsê da, bi t’omerîya hemû alîyên xwe va. Xudanê gotarê hemû dijwarîyên ç’areserkirina pirsgirêkê p’ir’ baş dizane û têgihîştina xwe ya r’êal ji bo r’ewşê diyar dike.

Di destpêka gotara xwe da V. Kazîmîrov dibêje:

“Bi p’eyam û hewlên Jak Şîrak 10-ê sibatê di P’arîzê da wê hevdtînên serokk’omarên Adirbêcanê û Ermenîstanê pêk bîn (ên veşartî. – K.M.), ji bo ku r’êyekê ç’areserîyê ji nak’okîyên Qerebaxê r’a bibînin. Di salnameya siyasî ya herdû t’erefan da jî di sala 2006-an da ji bo wê astengîyên r’astedêr nayên xuyan, ya ku hîvîyê û, heya, hinek xiyalan jî dide mirov...”.

Lê Kazîmîrov nêr’înên here balk’êş di dawîya gotara xwe da tîne zimên:

“...Serokên herdu welatan di P’arîzê da dertên ser dur’êyankê. Mirov dikare bi r’êyekê r’a, ya ku hê kesekî p’ê xwe neavtîbûyê û bi kelem e, berbi r’awestandina p’evçûnan û gav bi gav berbi normalkirina r’awşa herêmê va her’e. Helbet, hinekî hêsantir e, ku mirov bi r’êya nas a nak’okî û gengeşîyên tûj r’a bilivê. Lêbelê dikarin r’êyêke sêyemîn jî biger’in: bê bir’yar di cî da her’in û bîn, lê demê li xwe bibihurînin û bi gotinên bi hêvî wan gavên xwe veşêrin, di encamê da jî her ji bo domandina danûstandinan sozan bidin hev.

Heyf, ku encama hevdtînên P’arîzê dikare ev be”.

Erê, eger mirovek, ê ku pîrsgirêkên vê herêma çendîn zêrîyayî ewqas baş dizane, ê ku xwedîyê k’ana derfetên siyasî û dîplomasî yên ç’areserkirina pîrsgirêkên dijwar e, vê r’oja îroyîn xût li ser nêrînek a weha ye, divê mirov baş bide heşê xwe. Lê dîsa jî, her çiqas astîngî jî hene, dîsa mirov dikare bi alîk’arî û piştgirîya civaka navnet’ewî û r’ayê siyasî yê serokên herdu dewletan bigihîje ç’areserîya wê pîrsgirêkê – bila ew gav bi gav be, lê wisa, ku aştî û aramî bîn herêma Qerebaxa Ç’îyayî!

Helbet, eger dema r’êya ç’areserîya pîrsgirêkê biger’in, divê anegorî qanûn, zanedan û peymanên navnet’ewî yên di derbarê mafên gelan ên xwebiryardanê t’evbigêrin, mirov dikare bi hêvî be, ku ew nak’okî dê bi aştyane bê ç’areserkirin. Lê ji bo ku ew t’am an jî kê-m-zêde bi dadwerî bê ç’areserkirin, divê her weha pîrseke dinê ya girîng jî ji bîr nekin. Di nav çarç’evêya ç’areserkirin pîrsgirêka herêma Qerebaxa Ç’îyayî da her weha pîrsek a din jî heye, ya ku ji wê kêmtir dijwar û girîng nîne, ew pîrsgirêka kurdên navçeyên di navbera Ermenîstanê û Qerebaxê da ye, herêmen Otonomîya K’urdistanê – K’urdistana Sor e, ya ku wisa jî, wek ku Qerebaxa Ç’îyayî, di nava sînorên K’omara Adirbêcanê ya Sovêtî da bûye.

Di gotara birêz V. Kazîmîrov da di derbarê pîrsgirêkên wan herêman da hema wisa, di nav gotinan r’a derbaz dibe: ew jî t’ênê di du cîyan da navên navçeyên K’elbecarê û Laçînê bi bîr tîne:

“Lêbelê, gelek ermenî hevsa xwe dikin, ku Adirbêcan wê erkên xwe pêk neyne...: ditirsin, herêmen dagerkirî azad bikin (“piştbanda ewlekarîya Qerebaxa Ç’îyayî”), heya eger t’a dema r’êfêrêndûmê navçeyên di navbera Ermenîstanê û Qerebaxê da (K’elbecar û Laçîn) di destê xwe da xweybikin”. – Û paşê jî:

“... R’êfêrêndûmê dikarin piştî pênc salan r’a jî derbaz bikin û bi wê yekê ç’areserîya pîrsgirêkên K’elbecar û Laçînê nêzik bikin”.

Belê, dibe ku, di kontêksta siyaseta mezin da ew wek “pîrsgirêka K’elbecar û Laçînê” tê navkirin. Lêbelê, ew pîrsgirêka net’ewekê ye! Dibe ku dê bêhtir r’ast û dadwerî bûya, eger li şûna daxuyanîyên wek “pîrsgirêka K’elbecar û Laçînê” û “veger’a binecîyên adirbêcanî li Qerebaxa Ç’îyayî” vekirî bihata gotin, ku pîrsgirêka k’urdî li wir heye, pîrsa mafên otonomî yên net’ewekê. Ma ne, di salên 1923 – 1931-î k’urdên vê herêmê xwedî otonomî bûne – “K’urdistana Sor” hebûye, ya ku ji navçeyên K’elbecar, Laçîn, Zengîlan, Qubatlû û Cebrailê pêk hatye û navenda wê jî Laçîn bûye. Lêbelê, sala 1931-ê di encama siyaseta pant’ûrkîzmê, ya ku r’êvebirîya Adirbêcana Sovêtî wê demê dimeşand, ew ot’onomî hatye belavkirin. Lê, tiştêkî balkêş: pey belavkirina “K’urdistana Sor” r’a, heya dawîya salên şêstî yên sedsala bihurî jî, r’ojnameya wê ya sereke bi navê “K’urdistana Sovêtî” dihate weşandin...

Belê, hêja ye, ku mirov ji bo Qerebaxê binivêje, lêbelê, divê neyê jibîrkin, ku, eger di derbarê mafên gelan da tê axavtin, wê ner’astî û bêdadî be, ger mafên hinekan ç’areser

bikin, lê di derbarê hinekan da jibîr bikin. Ew jî, dema hemû pirsgirêk bi hevva girêdayî ne. Û, k'urdên ku zulm û zorîya dîrokî êdî temandine, tirsan wan heye, ku dema danûstandinan, ji bo xatirê jiholêr'akirina nak'okîyên di navbera dewletên cînar da, dê vê carê jî pirsgirêka wan gorî bikin.

Her çî jî hebe, gotara bir'êz Kazîmîrov, wek prênîsîp, p'ir' girîng e, her çiqas jî ew tevahîya pirsê nagire nava xwe. Ji vê hêlê va ew dikare bibe bingehekê, ya ku li ser wê dikaribû kontsêpta ç'areserkirina pirsgirêka herêma Qerebaxê bi giştî bihata avakirin.

JI HÊLA R'ÊDAKTSÎONÊ VA:

(Pêşgotina r'ojnameya "K'urdistan Azad")

Belê, bi r'astî jî, her çî jî hebe, heta dawîyê li ber ç'avan e, k'a ew "herêmên dagerkirî" çî herêm in û k'a xwedîyên wan herêman k'î ne. Wisa jî li ber ç'avan e, ku dema dor digihîje pirsgirêka k'urdî, di vê gotarê da gelek çaran bi gotinên t'omerî tê navkirin.

Heya dawîyê tê zanîn, ku di kontêksta ç'areserkirina pirsgirêkên vê herêmê da jiberêva di helwesta li hember ç'reserkirina pirsgirêkên heyî da êdî pêwîstîya guhar'tinan pêr'a gihîştîye: bi berjewendîyên t'erefên ermenîyan û adirbêcanîyan r'a divê wisa jî pirsberjewendîyên "binecîyên adirbêcanî"-yên sade bîn nihêr'andin. Û, ji ber wê jî, ji bo ku r'astîya pirsgirêka k'urdî ya di vê herêmê da bê r'onîkirin, em gotara bir'êz Korda Mad (Ezîz ê Cewo) a "Aş bi xiyalekê, aşvan bi xiyalekê" pêşniyarî bala xwendevanên xwe dikin. Ev got'ar, ya ku hê di sala 1992-an da wek r'êplîk li hember weşanek a r'ojnameya ermenî ya "Azatamart" hatibû nivîsîn. Lêbelê r'êdaksîona r'ojnameyê ji bo weşandina wê helwesteke ne dîyar dabû xuyan: ji xudanê gotarê r'a ne gotbû – na! û ne jî ew gotar weşandibû. Û, piştî 12 salan, sala 2004-an ew gotar ji ermenî hate werger'andin û di r'ojnameya "K'urdistan Azad" da bi zimanê k'urdî hate weşandin (№№ 7 û 9, sal 2004). Piştî vê weşandinê r'êdaksîona r'ojnameyê gelek name ji xwendevanan standin, û gelek ji wan daxwez kiribûn, ku em wê gotarê wisa jî bi r'ûsî biweşînin. Lê ji talebextan r'a, ji ber sedemên cuda weşana r'ojnameyê hate r'awestandin, û daxweza xwendevanan bê bersîv ma. Û naha, ew derfet çê bûye, û em bi dilxweşî wê gotarê pêşk'êşî bala xwendaevanên xwe dikin.

Her çiqas, hinek bûyerên dinê ji bo nivîsîna wê gotarê bûne sedem, lêbelê ewê di gelek waran da alîk'arîyê bide, ku wat'eyên gotinên wek "...pirsgirêka K'elbecar û Laçînê", "binecîyê adirbêcanî yên vê herêmê", an jî "...herêmên dagerkirî" bêne têgihîştin.

Û, dawîya dawîyê, weşandina gotarê bi zimanê r'ûsî, wê derfetê bide, ku nûnerên r'ewşenbîrîya ermenîyan bi xwe wê bixwînin, ji ber ku jixwe di destpêkê da ew gotar ji bo wan hatibû nivîsîn, a ku wisa jî di Ermenîstanê da nehate weşandin.

*
* *
*

Lê, berî ku derbazî xwendina gotarê bi xwe bibin, em binihêrin, ka r'êdaksîona r'ojnameya "K'urdistan Azad" piştî 12 salan (sala 2004-an) bi çî sedemê ew gotara bi zimanê kurdî weşandîye.

Weha, bala xwe bidinê, k'a r'êdaksîon çî dinivîse:

– Van demên dawîyê agahî gihîştin destê me, ku di Ermenîstanê da Parlamênta wê k'omara Sovêtê ya berê, ya ku piştî hilweşandina Yekîtîya Sovêtê serxwebûn bidestxistîye, bi fermî k'urd û k'urdên êzdî ji hev cuda kirine û êzdî wek net'ewek a ji k'urdan cuda, zaravê kurmancî jî, yê ku bi giranîya K'urdistanê r'a t'evayî ew bi xwe pê diaxivin, wek zimanê êzdîkî p'ejirandine.

Bi r'astî, em ji vê bûyerê mat'mayî û zendegirtî man: tiştêkî ne nêzîkî heş û aqilan e! Çawa dikare?

Em berbir'î Serokê Şêwra Otonomîya Net'ewî-Çandî ya K'urdên Fêdêratsîyona R'ûssîyayê Ezîzê Cewo bûn, ku ew, wek welatîyekî wê k'omarê yê demekê, pisporê k'urdzanîyê, vê bûyerê şrove bike.

Mamosta Ezîzê Cewo xwe ji şroveyan r'a amade nedît, ji ber ku, anegorî gotina wî, ev biencambûna pêvajoyek a siyasî ye, ya ku ji sala 1988-an va di Ermenîstanê da destpê bûye û mirov nikare bi gotineke kurt binirxîne. "Ji bo ku ev t'am bê têgihîştin, divê nirxandineke k'ûr û berfireh pêk bê, – mamosta got û weha domand: – Di dema xwe da, 12 sal berê min wek bersiva gotarekê nivîsibû, ya ku di r'ojnameya Partîya Daşnakan a "Azatamart" da hatibû weşandin: di wê da min nirxandinek a berfireh pêk anî bû û ew ji heman r'ojnameyê r'a şandibû. Lê r'êvebirîya wê r'ojnameyê du mehan weşandina wê îro sibê xist û wisa jî ew neweşand. Min gotara xwe ji bal wan hilda û ew wisa jî bê weşandin di arşîvên min da ma. Piştî van bûyeran min ew derxist, ji nû va xwend û dît, ku di wê da bersivên hemû pirs û pirsgerêkên wan leystokên siyasî hene, yên ku bi bir'yara vê dawîyê ya Par'lamêntoya Ermenîstanê biencambûnê.

Fermo, bersiva hemû pirsan jî hûn dikarin di wê da bibînin. Ew ji bo xwendin û weşandinê amade ye, min êdî ew ji ermenî wergeranîdye k'urdî".

Me jî bi spasdarî gotara mamosta Ezîzê Cewo hilda û em wê pêşk'êşî bala xwendevanên xwe dikin.

Wek ku tê zanîn, mamosta Ezîzê Cewo k'urdzan – zimanzan e, helbestvan û r'ojnameger e. Ew di cîhana r'ojnamegerîyê da bi nasnavê wêjeyî yê Korda Mad, tê naskirin. Dema ew êdîtorê r'ojnameyên "Botan" (bi zimanê ermenî – Yêrêvan, 1993-94.) û "Axîna welat" (bi r'ûsî-k'urdî – Moskova, 1995-98) bûye, ewî hem r'ojname hem jî helbest û gotarên xwe bi navê Korda Mad binnûs^[1] kirine.

Weha, gotara Korda Mad li ber we ye, bixwînin û bi xwe jî binirxînin...

AŞ BI XIYALEKÊ, AŞVAN BI XIYALEKÊ...

1. Laçîn: lêgênd^[2] û r'astî

...Piştî hildana bajarê Şûşîyê, dema di derbarê vebûna r'êya Laçînê da agahî belav kirin, têtêvîzîyona R'ûsîyayê, li ser agahîyên ji Ermenîstanê gihîştine destê wê, r'agîhand, ku li herêma Laçînê di navbera hêzên Adirbêcanê û k'urdan da şer'ekî giran dimeşe... Piştî demekê dîsa wê têtêvîzîyonê, vê carê jî li ser agahîyên ku ji Adirbêcanê gihîştibûn destê wê, agahîyên berê r'ed kirin. Heya r'êportyorê adirbêcanî got, ku li dijî ermenîyan di nav leşkerên Adirbêcanê da lezgîn, t'aliş, k'urd û nûnerên gelên din şer' dikin... Li ser van daxuyanîyan, xudanê vê gotarê r'êplîkek di r'ojnameya "R'êspûblika Armênîya" ("K'omara Ermenîstanê" – bi zimanê r'ûssî, 27. 05. 1992 s.) bi sernivîsa "Provokatsîyona r'agîhandinî, yan windakirina bîra xwe" weşand. Lê piştî çendekî r'ojnameya "Hayk" da (bi zimanê ermenî, 02. 06.1992 s.) li ser r'ûpelê pêşin, li cîyekî ber ç'avan, bi tîpên mezin daxuyanîya R'êvebirîya T'evgera Ermenîyan a Hemnet'ewî hate weşandin. Em wê daxuyanîyê wek ku heye, r'aberî xwendevanên xwe dikin:

"Di Laçînê da di navbera k'urd û adirbêcanîyan da p'evçûn dernek'etine.

Anegorî agahîyên ku T'evgera Ermenîyan a Hemnet'ewî ji çavkanîyên pêbawer girtine, dibêjin, di Laçînê û wê herêmê da p'evçûnên k'urd û adirbêcanîyan çê nebûne.

Agahîyên di derbarê, xwedêgiravî, p'evçûnên "giran" ên di navbera k'urd û adirbêcanîyan da, ku hatine weşandin, nayê zanîn, k'a, gelo ji çî ç'avkanîyan hatine girtin".

Di çapemenîyê da gotinên nûnerê Qerebaxê Mêlik'-Şahnazaryan jî hatine weşandin. Ew dibêje, ku Laçîn wan hildye, ewê jî wî di bin destê xwe da xweybikin. Pişt r'a xerîteyên Qerebaxê yên cihê reng, gotar û belgeyên din hatine weşandin.

...9-10-ê hezîranê di Laçîna dagerkirî û wêrankirî da civîna damezirandina T'evgera K'urdî ya Azadîxwez lidark'et. Di vê civînê da Daxuyanîya ji nûva avakirina dewleta k'urd a li vê herêmê hate p'ejirandin. Lê berî wê di heman Laçînê da nûnerên r'êxistinên

civakî yê k'urdên Yekîtiya dewletên serbixwe civîneke hevbeş pêk anîbûn û bir'yar dabûn, di nav r'êxistineke giştî-T'evgera K'urdî ya Azadîxwez da bibin yek. Û divê armanc û hedefa vê T'evgerê jî ji nû va avakirina dewleta k'urd be, a ku salên 1923-31-an di nava sînoren Adirbêcana Sovêti da hebûye, ya ku ji navçeyên Laçîn, K'elbecar, Qubatlû, Zengîlan û Cebrailê pêk hatibûye.

10-ê hezîranê di navenda Laçînê da li ser avayiyê "Biryargeha" T'evgera K'urdî ya Azadîxwez ala net'ewî ya k'urd hate bilindkirin. A ku piştî çend r'ojan bi destê fîdayiyên ermenî hate xarê...

Wê r'ojê li wir, wek ku fîdayiyên li wir amade bûn, digotin, ku dema ew k'etine vê herêmê, di navbera wan û k'urdên binecî da t'u p'evçûn darnek'etin, k'urdan t'u berxwedan nedane xuyanê. Digotin, dema ew k'etine wan gund û bajaran li wir şopên p'evçûnê germ dîtine (teknîkên leşkerî hatibûn welger'andin û şewitandin, laşên leşker û mirovên sivîl û h.w.d.).

Wê r'ojê em ewqasî agahdar bûn, yek jî, me Laçîna vala, şewitî û t'alankirî dît: dewsên p'encereyên demekê yê reş û tarî li me dinihêrîn – mîna ç'avên dayîkên ji hovîtîyên hinekan veciniqî û tirsîyayî!..

Laçîn!..

Cara duyan em di navbera mehên hezîran û tîrmehê da çûne Laçînê. Dîsa ew Laçîn bû – bê hêz û bê taqet, şil û seqet (felş) bûyî. Dîsa wek berê şkevtên p'encereyên avayiyên şewitî, wêran û t'alankirî, dîsa wisa pelîşî û tirsîyayî, melûl li me dinihêrîn... T'enê tiştek hatibû guhar'tin: Li ser k'ûça navendî ya bajêr li der-dorê cîgeha komendat girseyek a mezin a p'enaberên ji navçeyên Qerebaxê yê Şahûmanyân û Mardakêrtê hatibû û li ser hev berev bûbû. Her yekî, li k'u r'a gihîştibû, xwe avêtibû erdê: r'ûniştibûn, an velezîyabûn – jin, zar'ok, kal, pîr. Li ser dêmên hemûyan mora tirsê, westîyanê, birçîbûnê hebû...

Van mirovan r'êya berbi Ermenîstanê girtibûn, dixwestin demekê berî demekê van deran bit'erkînin, lê bê hêz bibûn. Digazînin: alîk'arîyek a bi r'êxistinî nîne, ya ku tê jî, di r'ê da belav û dêrs dibe, lê di k'etina navçeyên xwe da jî destê xiyanetê didîtin... Çi jî hebe, mirov in – diaxivin, digazînin, mat'may û hêrs dibin.

Êvarê, dereng nûnerê Ermenîstanê hat, bi gel r'a axivî, ber dilê wan da hat, soz da, ku alîk'arîya yekem, va ye, wê zûtirekê pêr'a bigîhîje...

Li ser van dîmenan û di nava wan r'a k'urdên Laçînê hatin ber ç'avê min – di nava du agiran da. Ji hêla Ermenîstanê va bi destê hinek r'êvebirên T'evgera K'urdî ew xapandibûn, gotibûn ku leşkerên ermenîyan wê wan azad bikin, ç'irûska hêvîyekê veketibû û wan ber xwe nedabûn. Heger wan ber xwe bida, wek ku fîdayiyên ermenî digotin, lingê ermenîyan li wir nediket. Jixwe leşkerê Adirbêcanê ne ku t'enê r'evîyabûn, wan jî ji hêla xwe va, çi ji destê wan hatibû, anîbûn serê k'urdan... Û dîrokê xwe dubare kiribû – k'urd vê carê jî bûn qurban – qurbana şer'ê ermenîyan û adirbêcanîyan, û bê war, bê dost û kes wêran û t'alan bûn, hatin zêrandin û qetilkirin...

Bersiva vê k'îyê bide?

Cîhana bê wîjdan û bê exlaq, û dema hovîtîyê! K'urdên bê serî û bê t'evger!- Van mitalan t'avefî nedidan min.

Temamîya şevê p'enaberan di k'ûçeyên Laçînê da bihurandin (gelo laçînî naha li k'u êwirîne? – hate serê min), t'enê, çiqas derfet hebûn, hinek kal, pîr û zar'ok li biryargehên k'oma sînorp'arêzên ji Gorîsê û Partîya Xrîstîyan – Dêmokratan da bi cîh û war kirin... Şervanan xurekê p'ara xwe li wan beş kirin û heya sibetirê êvarê birçî man. Hinek ewr li esmîn li hev civyabûn, baranek a sivik borizand, p'enaber li hev çûn-hatin, hewl dan xwe ji baranê bip'arêzin, lê st'ar nedîtin... Baş bû, ku baranê zû bir'î, an- na... Heger bajarê Laçînê û gundên dorê nedabûna devê êgir, dibe ku ewan p'enaberan ji bikaribûna demekê star bibûna... Kal, pîr û jinan gazîne xwe dikirin: "Baş e, – digotin, – t'alan kirin, em

têgihîştin, qanûna şêr' a nenivîsî ye, em jî t'alan kirine, çima agirdûdayî kirin, mirov jî şunwarên ku hiltine, bişewitîne?! Tiştêkî dinê ye, ger ew ji destê dijmin va berdana... ”

R'oja vegeer'a me li ber kanîya li ser k'ûça navendî ya Laçînê êdî p'enaberên ji gundê Çaylûyê (yê Qerebaxê) hatibûn û li ser hev berev bûbûn: ew jî wê şevê peya hatibûn û berbangê bi zor û cefayekî xwe ji Laçînê r'a gîhandibûn.

Laçîna şewitandî, t'alankirî û felşbûyî nikaribû wan jî sitar bike.

Wê sibê nobedarê cîgeha komendat sînorp'arêzê ji Gorîsê Anûşavan Hayrapêtyan divê r'êberîya me berbi bakûr bikira – berbi gundên Laçînê yên milê K'elbecarê va. Anûşavan ji gundê Aravazê bû, yê navçeya Gorîsê ya Ermenîstanê, fermandarê bêlûka sînorp'arêzên ji gundê xwe bû. Wek ku wî ji me r'a got, têk'ilîyên wan bi gundên k'urdan ên cînar r'a berê jî hebûne. Digot, ku heya piştî p'evçûnên ermenî – adirbêcanîyan ên salên 1988-an jî têk'ilîyên wan û gundîyên herêma Laçînê, her çiqas êdî lawaz bibûn jî, lê r'anewestyabûn. Wek ku wî digot, k'urdên wê herêm bi têgihîştinî li doza ermenîyan a azadîxwez dinihêr'în (û ev jî xwezayî ye), digot, ku çî ji destê wan hatîye, alîk'arî dane hev. Bi gotina wî têk'ilîyên ermenîyan û k'urdan t'imê jî ên dostane bûne. Heya serhatîya hevaltîya xwe û P'irxanê ji gundê Garak'êşîşê ji me r'a vegot – wek ku mirovekî cîhaneke nû veke!

– Hûn dizanin? – P'eyvên wî yek bi yek li dû hev ji devê wî r'êzdibûn, – gelek li van deran xwe wek t'irk didan xuyanê (ermenîyên wan deveran adirbêcanîyan r'a “t'irk” dibêjin), çawa bikirana, hûn r'ewşa wan t'exmîn jî nakin! Ez bi gelek li van deran xwe da bi zimaneke din axivîne. Min pirsîye, derk'etîye, ku bi k'urdî diaxivin, ew bi xwe jî k'urd in... Û ji wê r'ojê va danûstandinên me yên k'ar werguhêzî yên hevalatîyê, dostanîyê bûn... Ewana bawerîya xwe bêht'ir bi me tanîn! – Di dawîyê da Anûşavan li ser da zêde kir.

...Mîkrootobûsa ÛAZ-ê ya r'engê k'eskê tarî em berbi bakûr va dibirin. Em herdu gundên destpêkê derbas bûn. Wek ku Anûşavan gotibû, divê li wan deveran teknîka zirî ya şewitî mabûya, ya ku demên p'evçûnan k'urdan welger'andibûn û şewitandibûn. Bi gotina wî OMON-ên (t'îmên t'aybet) adirbêcanî li wan deveran di bin t'ehdîda ç'ekan da k'urd neç'ar kirine, ku bi wan r'a her'in, û ji ber ku k'urdan berxwe dane, nexwestine her'in, beşekî wan bê hêvşandin, qet'il kirine. Bi gotina Anûşavan, dema êrîşa ermenîyan k'urdên binecî bi OMON-an r'a p'evçûne û berbi bakûr va meşîyane – berbi K'elbecarê, lê OMON – berbi başûr, berbi Qubatlîyê va. Digot, ku k'urdan xwestîye piştî K'elbecarê, li ser Qazêx r'a ji Adirbêcanê derên û berbi R'ûssîyayê va her'in.... Li wan deveran em r'astî cilên mirovên kuştî hatin, ku di nav xwîne da mewicî bûn, cî-cîna jî xwalî avêtibûn ser û ew nixamtibûn. Laşê mirovan nemabûn. Hinekî wê da cîyê teknîka şewitî, parç'eyên wan ê belavbûyî vîalî-wîalî k'etibûn, li dora wan jî fişekên gulekirî yên vala hebûn, ji her cîyan bîna k'izûr dihat. Deşta şêr'... wek deşta şêr'! Anûşavan ji dûr va gundên di qefên ç'îyayên bilind û hasê da, ên ku wek hêlûnên teyrên baz xuya dikirin, nîşanî me dan. Li wîalî wan ç'îyan navçeya Gorîsê bû. Ç'îyane p'ir' hasê bûn.

– Dibînin, çî ç'îyane hasê ne, - Anûşavan got, - heger gundên k'urdan nînbûna, heger p'evçûnên k'urd û adirbêcanîyan nînbûna, me dijwar bikaribûya Laçînê hildin. Hûn bi xwe binihêr'in, heger t'avîyên (mewzî) xwe baş bigirtana û ber xwe bidana, k'îyê bikaribûya li wan ç'îyan r'a derbas bibûya?

Bi gotina Anûşavan, heya hatina hêzên ermenîyan, hê di mehên adar û nîsanê da li van deveran bûyerên dramatîk pêk hatine.

... Em li van deveran r'astî t'u laşî, yan p'arç'eyên laşên kuştîyan nehatin. Bi gotina Anûşavan wan bi xwe t'u term binax nekirine, veneşartine. Windabûna laşên kuştîyan wî weha şrove dikir. Bi gotina wî, di van daristanan da hê jî xortên k'urd mane. Û, k'urd jî, di çî mercan da dibe, bila bibe, kuştîyên xwe bê ç'alkirin nahêle...

Dîmenekî p'ir' melûl bû – gundên wêran ên vala, li derdorên r'êyan zît'olên cilên kuştîyan ên di xwîne da mewicî, p'arç'eyên teknîka leşkerî, pêlîstikên zar'okan, tiştên

navmalê... Li van deveran trajêdîya mirovî hatîye lîstin û hemû p'erde û lîstikvênên wê hîn ne dîyar in!

Demê bi xwe her tiştî di cîyê wan da dayne, û dîmenên vê trajêdîyê wê bi hemû dêtayên wê yê kêma va t'emam bibe... K'î dizane k'engê?

...Vê carê em di Laçînê da şopa k'urdan diger'îyan: tiştên navmalê, t'aybetîyên wan ên k'urdî, p'irtûk, name, belge û tiştên din. Wek ku tê zanîn, wargwhê k'urdî ya demekê – bajarê Laçînê, bi siyaseta serdarîya Adirbêcanê ya bêk'urdkirinê, êdî dema dagerkirina wî ya ji hêla ermenîyan va ji sedî 80%-ê binecîyan bibûn adirbêcan. Her çiqas k'urd di bajarê xwe da bibûn kêmanî, lê dîsa jî ji hemû k'urdên herêmê yê here aktîv di vî bajarî da jîyane: di malên wêran û şewitî da me nameyên k'urdan, ên ku wan ji serokatîya Sovêtê r'a şandibûn – ji bo ew bêdadîya dîrokî bê r'akirin û mafên wan ê otonom li wan vege'înin – bi dehan û sedan binnûsên k'urdan va, bersivên wan, ên ku ji “jor” va hatibûn. Êdî di derbarê gundên k'urdan da nabêjin. Dertê holê, yê ku haya wan ji tiştêkî nînbûye, dîsa em bûne. Li wir di navbera k'urdan û serdarîya Adirbêcanê da nak'okî û p'evçûn hebûne, k'urdan ji bo mafên xwe yê net'ewî têk'oşînek meşandine, bêyî dengderxistineke zêde... Di mala yekî da me hejmarên rojnameya “R'ya t'eze” yê li hev berevkirî û dirûtî dîtîn. Ji bo her salekê cûda ji salên 70-î û vir va – r'ojnameya ku di Yêrêvana p'aytexta Ermenîstana Sovêtî da r'onayî dibîne! Bi dehan p'irtûkên k'urdî û yê di derbarê k'urdan da, çapemenîya bîyanî. Ji belgeyên ku me dîtîn, dida xuyan, ku navê xudanê malê Bendalî Bendalîyêv bûye – r'ewşenbîrekî k'urd, welatp'arêzekî dilsoz. Di maleke din da me p'irtûka dîroka Adirbêcanê ya ji bo dibistanên r'ûsî dît, a ku sala 1977-an hatibû weşandin. Hinek r'ûp'elên vê p'irtûkê qat kiribûn û cîh – cîna hinek tişt jî bi qelemê k'ivşkiribûn. Ew agahîyên di derbarê herêma Qerebaxê û k'urdan da bûn. Di derbarê wan da emê hê biaxivin.

...Em bi dilekî kul û kovan vege'îyane Yêrêvanê. Gotinên ç'ekdarên ermenî: Vanîk û Anûşavan Hayrapêtyanan, Slavîk, Artyom û yê din hîn jî li ber guhê me bûn, ên ku li ser axa K'urdîstana Sor a dagerkirî weke xwedî dimeşîyan û li ser bûyerên dagerkirina Laçînê gotinên xwe digotin. Gelo çiqasî r'ast dibêjin? Lê heger hemû ç'îr'ok in? R'astî li k'u ye? Lê gotina t'erefê dine li k'u ye? K'urdên Laçînê çima bêdeng in? Pirs in, ... pirs in, ... pirs!

2. K'î divê dersê bide k'ê?!

...Em hê jî bi derûnî di bin bandora bûyerên Laçînê da bûn – tiştên ku me li wir dîtibûn: danûstandin, vegotin û dîmenên cuda. Em hê jî nkribûn fêrî jîyana Yêrêvanê bibn, a ku bi r'û va aram, bê xem û ji şêr' dûr dihate xuyan. Jîyana wê ya r'ojane hê em di nava xwe da nedabûn jibîrkiirn, dema hevalekî min du hejmarên r'ojnameya “Azatamart” (bi r'ûsî, hejmara 26/69, 26-ê hezîranê – 2-ê tîrmeha 1992-an û hejmara 27/70, 3 – 9-ê tîrmeha 1992-an) drêjî min kir û got: “Binihêr'e, di van da tiştên balk'êş ji bo te hene!”

Min herdu hejmarên r'ojnameyê per'kirin: di her hejmarekê da r'ûp'elekî r'ojnameyê (bi giştî – du r'ûp'el) gotarek bi sernivîsa “Ên kurd” hatîye weşandin û xudanê wê jî Gar'nîk Asatiryan e.

Helbet, min hîç hêvî jî nedikir, ku G. Asatiryan jî dê, wek k'arbixêrên ermenî yê wextekê, di çarç'oveya hêz û derfetên xwe da, li ser t'aybetmendîyên k'urdan ên net'ewî, çand û hunera wan r'aweste. Lê ku armanca gotara wî dê ew be, ku nîgara gelê k'urd wek a dijmin binitirîne, min ev jî hêvî nedikir. Ev tiştêkî nû nîne, Gar'nîk Asatirîyan (ji vir û pêva: G.A.) agahîyên di derbarê dîrok, ziman, çand û hunera gelê k'urd da lêp¹³ û berovajî dike, me ew jizûva dizanibû. Lê ku ewê wan t'evan ji bo armancên xwe yê gemar û k'etî bik'ar bîne, ...? Her çî jî hebe, em binihêr'in, k'a ew çawa nîgara dijmin dinitirîne û bi xwe jî paşê, xwedêgiravî, “hewl” dide, ku xwe “efû” bike: “Ev gotinanên han nayên wê wat'eyê, ku xudanê van r'êzan dixweze r'engan tîr û tarî bike – nîgara k'urdan wek a

dijminê ermenîyan ê qanî-qan ji nû va vejîyan bike, an jî, Xwedê neke, ji bo k'în û nefreteke li dijî k'urdan gur' bike.” (“Azatamart”, hejmar 27(70), r'ûpel 10).

Wek ku tê xuyanê G.A. bi xwe jî hîs dike, k'a çî bîn ji nivîsa wî tê û, ji bo wê jî...

Her çiqas jî ew, xwedêgiravî, xwe “efû” dike, lê hema di wê “efûkirinê” da û bi wê ew ne r'astêdêr ji xwendevan r'a dibêje – çî ku min nivîsîye, hûn hema wisa jî têbigihîjin.

Her çî jî bûbe, em binihêr'in, k'a G. A. çawa bi “zanistî” “nîgara dijminê qanî-qan ji nû va vejîyan” dike, û ji bo gelê mijara gotinê, wek net'ew, çarç'oveya mafê jîyanê datîne û di nava wê t'evlîhevîya “zanistî” ya wek girara qereçîyan da “serk'êşîyê” ji gelê xwe r'a dike, û berê wî dide k'u?..

“Dertê holê”, ku heya G. A. di Ermenîstanê da di derbarê k'urdan da “helwesteke sade û r'omantîk” hebûye. “...*Dibe ku, ji ber ku di dema Sovêtê da li hember pîrsa net'ewan nêzîkbûneke t'aybetî hebûye, bi giştî di derbarê k'urdan û çêbûna wan, dem û r'ewşên belavbûna wan a di Ermenîstanaê da, bi t'aybetî helwesteke sade, r'omantîk hebûye, ne ku îdêolojîyeke zanistî ya bi belgeyan va xîne*”. Û piştî vê: “*Bêagahîbûn, an jî, dibe ku, kêmasîya biwîjdanîya zanistî digihîne wê, ku gelek caran têkilîyên ermenîyan bi k'urdan r'a digihînin... demên Tigranê Mezin^[4]. Pîrs di wê da ye, ku ji Înc'îç'yan û Lêo^[5] destpîrî, di nav r'ewşênbîrên me da ew t'exmînek a çewt belav bûye, ku marên^[6] kevînar pêşîyên k'urdan in...*”

Di sêrî da divê bê gotin, ermenîyan ne ku t'exmîn kirine, ku mar (med) pêşîyên k'urdan in, lê p'eyvên *mar (med)* û *k'urd* ji bo wan p'eyvne yekwat'e bûne: ermenîyan gotine *k'urd*, *med* têgihîştine, gotine *med*, *k'urd* têgihîştine. Li ser vê emê hê bi hûrbînî biaxivin... Û, ya duyem, hûn tê digihîjin, “dertê hole”, ku berê ermenîyan cînar û dost û dijminên xwe ji hev cuda nekirine, gelek tişt çewt tê gihîştine, û G. A. jî, nîzanî ji k'u derk'etîye, r'abûye, meydanê dixwîne û “dersê” dide gelê ermenî?!

Mîrov nîzane bik'ene, an bigirî!..

Ev êdî çend sal in, ku G. A. hewl dide, gelê ermenî bi “îdêolojîyek a zanistî” (belê, belê, hema wisa – “îdêolojîyek a zanistî”, ango – ya dijk'urdî) p'erwerde bike û ji bo wê jî “destk'evtîyên zanistê yên vê dawîyê ji xwe r'a dike bîngêh”. Û kesek nîne, ku ji vî mirovî bipirse: “Gotina te di derbarê k'îjan zanistê da ye? Çima li vir pîrs di derbarê zanistên xwezayî, yên r'astîrîn da ye, di derbarê xê'tan, şûmêran (sûmer), an gelên din ên dîrokî da ye? K'urd hebûne, hene û îro jî bi cînarîya ermenîyan û Ermenîstanê, hene, û, heya di hinek cîyan da jî herdu gel di nav hev da dijîn. Û gelê cînar jî (heya du biryaên cînar, bav û kur' ên cînar), heger ew cînarên hev in, wê di navbera wan da hem p'êwendîyên qenc hebin, hem jî yên xirab. Û ev jî ji berjewendîyên wan, an jî bi destê dijminê herdu alîyan û ceşş û k'irêkirîyên wan dijminan ên xwefîroş û k'irê'tê. Divê herdem tiştêk bê zanîn (û dîroka mirovayîyê evê ji me r'a dibêje!) ne gelên yekawa bê'sûc hene, ne jî yên yekawa sûck'ar: divê mirov di nav xwe da wêrekî û paqijîya mirovî ya sade bibîne û bikaribe di nav gelê xwe da hem wê bibîne, hem jî a dinê – hema ji bo xatirê dihatûya gelê xwe û berdewamîya wî.

Lêbelê, hema di çapemenîya ermenîyan a dawîya sedsala XIX û destpêka sedsala 20-î da, ya ku G. A. behsa wê dike, di derbarê t'êk'îliyên k'urd û ermenîyan da r'ûpelên r'onî – çiqasî bixwezî, hene... Hema divê mirov xwe şûna koran daneyne, bibîne, binase û bide nasîn. Û ew jî ji herdu gelan r'a weke hev pêwîst e. An na, di gotara G. A. da wek tayekî sor xêzek derbas dibe, ya ku xwendevan ji r'êya r'ast dîrdixe û dixalîfine. Her çiqas ê dizane, jixwe dizane, hema hinekên bê agahî dikarin bik'evin bin bandora wan derewan, ji ber ku ew li ser r'ûpelên çapemenîya fermî hatine weşandin. Divê bê gotin, ku ev gotara bi serê xwe yeke t'enê nîne, ku G. A. ji sala 1988-an û vir va bi hev'ar û hev'arên xwe yên ji r'ojnemeya “P'yûnîk” va bi t'evayî davêjin meydanê û bi wan hest û hîsên gel gur'dikin û bi wan dilîzin, ên ku bêyî wê jî hatine tez û t'evlihevîkirin û... Baş e, ku yên vî r'engî di nav civaka ermenîyan da kê'm in. Dîsa baş e, ku lîstîkên weha li vir pêk tên, an na, heger ew di nav civakeke fanatîk da pêk bihatana, bi “dua-drozgeyên” *asatirîyanan* naha ji zû va!..

3. Nexwendîtî, femkorî, yan..?

Siyasete ku xwestine dutîretîyê bikin nav gelê k'urd û wî ji hev p'arç'e bikin, nû nîne. Ew siyaset ereban, farisan û t'irkan ji berê va bik'aranîne. Lêbelê, îro tişteki balk'êş li vira heye: li vira vê siyasetê, ya ku xelkê jizûva avîtine ser k'ulîkê dîrokê, G.A. û yên mîna wî, xwe pê'r'a gîhandine, ew r'evandine, p'ine kirine û li ser xaka Ermenîstanê didine lîstikê. G. A. k'etîye k'uç'e û kolanan gewrîya xwe diqelêşe, k'axazokan tenî dike, ji ç'ermê xwe dertê, ku "îzbat" bike, xwedêgiravî, *êzdî û zaza ne k'urd* in. Û ji bo wê jî mînakekê tîne, ew jî ew e, ku hinek *êzdî* dibêjin, em ne k'urd in. Berê pêşin ew hewa siyasî, ya ku bi saya yên mîna G. A. di Ermenîstanê da çê bûye, baş e, ku *êzdî* dibêjin – em *êzdî* ne, û dest ji wê jî bernadin û nabêjin, ku ew ermenî ne.

Her çiqas, k'î dizane, dibe ku ew dem jî bê!

...Lê, dîsa jî balk'êş e, ku ew wê nêr'îna dûrî heş û aqilan, a ku dibêjin, xwedêgiravî, zaravê kurmançî yê zimanê k'urdî, yê ku k'urdên *êzdî* jî pê diaxivin, *êzdîkî* ye, nap'ejirîne û ji wan r'a dibêje yên *k'urdîzarav* (bi ermenî – *k'rdalêzû*).

A din, ma yên wisa di nava k'îjan gelî da t'unene?! Em hema hildin ermenîyên kat'olîk, ên ku xwe "*fr'ang*" nav dikin. Ev hevtê sal e, Ermenîstan wek k'omar heye, siyasteke net'ewî ya yekgirtî tê meşandin, dibistanên net'ewî hene, lê hê jî *fr'ang* (ermenîyên kat'olîk) p'ir' bêyî dilê xwe hal û zewacê bi ermenîyên grîgorîyan r'a pêk tînin, ew xwe *fr'ang* dihmêrin, lê ên dinê – ermenî, ji zaravê xwe r'a, yê ku ew û beşekî mezin ê ermenîyan va pê diaxivin, nabêjin ermenî, dibêjin *fr'angî* (bi ermenî – *fr'angêrên*), hema em hemû jî dizanin, ku ew r'engekî ermenîyan in. Êdî ez di derbarê ermenîyên hemşî da nabêjim, ên ku misilman in.

Heger çend *êzdî* di bin bandora wê hewayê da, ya ku *asatirîyanan* di Ermenîstanê da saz kirine, ji xwe r'a nabêjin k'urd, nayê wê wat'eyê, ku *êzdî* ne k'urd in. Wê demê em dikarin wan k'urd hesab nekin, lê bi giştî nikarin *êzdîyan* k'urd nebînin, ji ber ku di cîhanê da net'eweke wisa nîne, *êzdî* t'enê di nav k'urdan da hene, di welatê me K'urdistanê da hemû *êzdî*, bi zîyareta xwe Lalişê va, bi r'êbeîrya xwe ya olî va weha dibînin: "*Ê ku ne k'urd e, ne êzdî ye, yê ku ne êzdî ye, ne k'urd e!*". An: "*Heger êzdî ne k'urd e, êdî k'î k'urd e?!*" Di Ermenîstanê da jî cîyê ku k'urdên *êzdî* xur'û di cîyekî da dijîn (di gundên xwe da), vê dibêjin, ên Gurcistanê jî vê dibêjin...

A dinê, divê r'ûyekî mirov hebe: ew çawa dibe, ku heman G. A. di hevpeyvîna xwe ya "Kurdistan prês"-ê da dibêje, ku di Ermenîstanê da "60 hezar k'urd" dijîn ("Kurdistan prês", № 87 (17-18) 26. 12. 1990, r'ûp'el 13), lê heman hevpeyvîn bi werger di r'ojnameya "P'yûnîk" da (№ 2(10), 16. 02. 1991 r'ûp'el 24) bi zimanê ermenî tê weşandin û "60 hezar k'urd" dibe "çend hezar k'urd". Û îro jî wek berêhewl dide, "îzbat" bike, xwedêgiravî, di Ermenîstanê da "... *heya bûyerên sermaweza 1988'an der-dorê 5-6 li wir hezar k'urd dijîyan... Naha di Ermenîstanê da, dibe ku, ne zêdeyî 700-1000 k'urdî mabin...*". Tu ji mirovê weha r'a çi bibêjî?! Ew bi xwe bawer e, wek ku heye, wisa jî maye – îro weha pêwîst e, weha dibêje, sibê cûr'ekî din pêwîst be, wê tişteki din bibêje...

Di gotara xwe da G. A. di derbarê wêje û çanda k'urdî da agahîyên salên 50-60-î tîne, demên jîyana klasîkên wêjeya k'urdî jî 3-4 sedsalan vir va tîne, hîç gotinekê jî li ser çanda k'urdî ya kevnar nabêje.

Di wan du hejmarên r'ojnameyekê da pey hev gotara "Yên k'urd" hatîye weşandin, ew jî di bin r'ûbrîka (sernivîsa giştî) "Cîhana hawîrdora me" da, û mirov tişteki bîngêhîn ê nêzîkî têgihîştina mirov di wê da nabîne. Ji wan bîna "*k'axezokên*" şer' û şilt'axên herêmî yên sedsalên navîn tê.

Helbet, di r'ojen me da jî mirov dikare mînakên weha di hinek deverên dinê da, li bal şer'lat'anên "dîrokê" yên din jî bibîne, lê li vir mirov ji tişteki mat'mayî dimîne: G. A. belge û îzbatîyên dîrokî nayne, nanirxîne, û paşê r'ed nake; ew dibêje, ji bo ku bibêje, ji bo nêr'înekê di nav civakê da biçîne. Wek ku tê xuyanê, ewî darsa xwe ji Gêbêls baş girtîye, ê

ku di dema xwe da gotîye: “Dereweke sed carî bê dûbarekirin, wê li şûna r’astîyekê bê p’ejiranddin!”.

Her çiqas G. A. digazine, ku “...derfetên weşana r’oanameyê bi sînor in”, lê, eger gotineke mirov hebe, du r’ûp’elên r’oanameyê jî bes in, ku mirov bikaribe, çawa bixweze, wisa jî her net’ewekê nîşanî xwendevanan bike..

Çi dibe, bila bibe, gotin avîtine meydanê, û ew divê bê bersiv nemînin.

G. A. dinivîse, ku di vê serdema bilindbûna xwetêgihîştina k’urdan a net’ewî û k’ombûna wan da, xwedêgiravî, hewl tên dayîn, ku hinek berekên (eşîr) îranî, yên wek zaza, lûr û gûranan (ew navên ‘lor’ û ‘goran’ bi wan şêwazan dinivîse! – K. M.) di nav xwe da bihelînin.

Berê pêşin, eger ew yekîneyên îranî yên cuda ne, ew çima wana berek (eşîr) û ne ku gel navdike. A din jî, çima bi bawerîya G. A., ji bo van berekan, ên ku yên k’urdî ne, t’enê di vê serdemê da hatîye zanîn? Hîn di destpêka sedsala XX da zimanzanê ermenî yê navdar Hraçîya Aç’ar’îyan, dinivîse, ku zaza xwe k’urd nas dikin (û divê bê zanîn, ku zimanzanê bi nav û deng ew agahî hê jimêjva destxistibûne).

Û G. A. xwe di vê lîstika xwe da ewqasî ji bîr dike, nabîne, ku her çiqas bi xwe li cîyekî navê berekê wek “gûran” dinivîse, li cîyekî din “herêmek a ne eşîrî” bi “goran” nav dike (li şûna ‘û’, ‘o’ dionivîse), dîsa jî nikare mirovê şareza û pispor bixapîne. Ew dinivîse: “Her weha k’urdên bê eşîr jî hene, yên bajarî, herêmên ku gundîtîyê va mijûl dibin û yên din, ên ku “kurmanc”, “miskîn”, an “goran” tên navkirin: – Li ser vê me dixwest, ku G. A. navên “kurmanc” û “goran” hemberî navên zaravên k’urdî yên “kurmancî” û “goranî” bikira, û ewî bi xwe jî dê bidîta, k’a ew “r’astîya” wî çiqazsî r’astî û zanistî ye. Paşê, ji bo ku van bêheşî û sewdaserîyên xwe “îzbat bike” ew dinivîse: “... Wek ku zaza, her weha lûr û gûran (mabesta wî ‘lor’ û ‘goran’ in.- K. M.), hema-hema bi t’aybetmendîyên xwe yên êt’nografîk va yekîneyên îranî yên ji k’urdan cuda ne”. – Minê li vir şêwir bida “k’urdzanê” nûpatî, ji bo ku ew biçûya mûzexaneyê êtnografîk a Sardarapatê (Serdarava) û bidîta, k’a ermenîyên herêmên cuda (yên Stembolê, Hemşênê, Qerebaxê, Sasûnê, T’iflîsê, Yêrêvanê û yên din) çiqas bi cil û libasên xwe va mîna hev in, bi van ermenîyan r’a biaxivîya û bidîta, k’a ew û wan va (an jî ew bi xwe di nav hev da) çiqasî ji hev fêm dikin. Her çiqas ev êdî 70 sal in, ku “siyaseta” xwendin û p’erwerdeya zimanekî wêjeyî tê meşandin, lê hê jî di Ermenîstanê da çend zaravên ermenî hene, jîyan dikin (û wê hê jî hebin!) û gelek caran jî di navbera wan ermenîyan da, yên ku zimanê wêjeyî nizanin, divê yan wergêrek hebe, an jî divê herdu ermenî bi zimanekî din ê duyemîn bi hev r’a biaxivin, ê ku herdu jî dizanin. Bi giranî jî evê r’olê zimanê r’ûssî dilîze. Û ev jî xwezayî ye, mirovê zane û xwedî t’erbiye ji bo vê ne mat’mayî dimîne, ne jî vê yekê ji bo xirabîyê bik’ar tîne...

G. A. armancek daye pêşîya xwe û ew armanç li pêşîya wî k’etîye, ewî jî çavê xwe girtîye, devê xwe vekirîye û daye pey, dimeşe...

Weha, anegorî “t’êza” G. A. a “zanistî” k’urd di destpêka sedsala 19’an (1813, 1828) ji herêmên Îranê yên bakûr-r’ojavayê hatine ser axa Adirbêcanê.”

Di sêrî da divê bê gotin, ku her çiqas ne di destpêka sedsala 19-an, ne jî heya damezirandina K’omara mûsafatan, ne jî ji bo herêmeke erdnîgarî (cêografîk) a dinê, ne jî ji bo herêmeke xweser navê Adirbêcan nehatye gotin, lê dîsa jî di wan herêman da k’urd hê ji mêj va hebûne. Weha di p’irtûka “Dîroka Adirbêcanê” ya bi zimanê r’ûsî da, ya ku me di maleke Laçîna wêrankirî da dîtîbû (xwedîyê malê cî-cîna bi pênûsê hinek agahî k’ivş kiribûn û p’elên wê jî qat kiribûn) agahî hene, yên ku hem nezanîya G. A., hem jî armanca wî ya nep’ak derdixin holê. Weha:

Di r’ûp’elê p’irtûkê yê 36-an da belgeyek hatîye weşandin, di wê da tê gotin:

“Vegotina dîroknivîsê ereb ê sedsala dehan El Îstaxrî di derbarê bajarê Bardayê da.

...Li ber dergehên Bardayê, yên ku wek “Dergehên k’urdan” dihatin binavkirin”...

Lê di r’ûp’elê 37-an da §10-an a beşê V, di bin sernivîsa “Avabûna dewletên fêodalî” da tê gotin:

“...Salên 70-î yên sedsala X di herêma Gencayê da dewleta k’urdan a Şeddadiyan ava bûye. Serdarekî vê dewletê Barda û Şek’î hildane û gîhandne aqarên di bin serdarîya xwe da. Şeddadiyan derbeke giran gîhandine Qezeran û bi wê yekê dawîya êrişên wan anîne... Di dema desthilatdarîya Şeddadiyan da li ser ç’emê Erez p’ira hatîye çêkirin, bingeha diravbir’înê û dergehên hesinî yên Genceyê yên bi nav û deng hatine danîn”...

Lê cîguhastina k’urdan a girseyî ya ji Îranê berbi Başûrê Kafkassîyayê va– li ser xaka Adirbêcana îro bi fermana Şah Abbas pêk hatîye – ji bo ku sînorên dewleta xwe yên bakûrî bi hêz û mit’în bike.

Ev hê hemûşk nîne: dema G. A. navên herêmên k’urdan di Îranê da li pey hev r’êz dike navê “Ostana K’urdistanê” (bi farsî: “Ostanê K’ordêstan”) ‘ji bîr dike’, ya ku li ser her xerîteyêke Îranê ya fermî jî heye.

...Û weha, mirov dikare bi r’êzê her “îsbatîyek” G. A. “îsbat” bike.

Di gotara G. A. da her weha beşê “Darayî” jî heye: bi giştî ji çend r’êzikan e. Li vir jî armanca vî mirovê hanê ew e, ku k’urdan tenê wek gelekî k’oç’er û r’ênçber bide nasîn. Helbet, heger tiştekî wisa hebûya jî, tu şerma wê nînbû (her çiqas, anegorî agahîyên pêbawer, ji 100-î 40 %-ê binecîyên K’urdistanê zêdetir bajarî ne)... Mirov divê ewqas femkor nînbê, ma ji bo gelên cîhanê yên here pêşkevî k’î r’ênçberîyê dike? Ma, gelên ku di nav wî da hem jî r’ênçber nînbûn, hene, gelo?

A din jî, eger k’urdan r’ênçberî kirine jî, ya xwe kirin, û ew jî r’êyêke t’ek-t’enê bûye, ji bo ku azad û serbixwe bijîn û xulamtîya bîyanîyan nekin. Û ji xêynî wê, di cîhanê da gelê xur’û r’ênçber, xur’ê k’arker, xur’û bazirgan hene, gelo? Lê ji bo ku “gotina” xwe îzbat bike û xwendevanan bide bawerkirin, G. A. gotineke k’urdî ya gelêrî “dibîne” û wek mînak tîne: “Şivantî-mêrantî”. Wek tê xuyan, G. A. helbestên helbestvanê ermenî yê mezî Hovhannês T’ûmanîyan nexwendine (wê li k’u bixwenda?!..). Eger xwendibûya, wê dîtibûya, k’a T’ûmanîyan çawa pesnê lehengîya “lawikên şivan” dide... Û ji bilî vê, eger ji bo şivantîyê bi r’astî jî mêrxasî pêwîst nake, çima her mirovek nikare şivanîyê bike – bi berf û bager û tavî-teyrokê r’a her’e şêr’, gur û çeçela û dizan bide r’evandin!..

Xwe wisa hêsa nîne?!..

Lê dîsa jî!

Eger mirovê ku xwe ewqas zaneyê r’abûn-r’ûniştina gelê k’urd dibîne, divê ji bîr nekira (dibe ku wisa pêwîst bûye!), ku gotineke gelê k’urd a din jî heye, ya ku hê bêht’ir t’aybetmendîya gelê k’urd a net’ewî derdixe holê:

“–K’ê dinê dot?

– Yê k’ir’î – fîrot!

Dîsa negihîşt Xeta cot!”

Weha, ev e formûla gelê k’urd a bextewarîya mirovî...

Êh, çi bikî, eger mirov bixweze, wê bikaribe her tiştî “bibîne” û berovajî bike, t’enê dimîne, ku ew bikaribe, wek mrov, destûrê bide xwe, ya din pîrsa têknîkê ye...

Pişt’ra jî G. A. dîsa bi wê “pisporîya” xwe, ji bo pîrsa ku di ç’avkanîyên ermenîyan ên sedsalên navîn da navên k’urd û med (bi ermenî – mar) yek dihatin dîtin, r’ed dike û wek îsbatîya bingehîn van gotinan tîne: “...Berbangê zû ên med hatin, ên ku k’urd tèn navkirin” (Arîstakês Têvkants, Hayêrg, T’îflîs, 1882, r’û 175-180, bi zimanê ermenî). Bûyera mijara gotinê, ango hatina med-k’urdan a berbi dêra T’spinê, 19-ê gulana 1426-an pêk hatîye. Her çiqas ev gotin îzbatîya yekwat’ebûna p’eyvên k’urd û mad//med in, dîsa jî G. A. anegorî şanê xwe yê mirovî û zanistî hewl dide, ku yekwat’etîya van p’eyvan, ango medbûna k’urdan, an k’urdbûna medan r’ed bike. Û vê jî çawa dike?! Dibêje, ku, xwedêgiravî, ew “hinartineke wêjeyî” ye. Û li vir jî ew bi xwe weke xwe dimîne. Ew bi “hostatîya” xwe ya lêpokîyê (sextek’arîyê) ç’avkanîyêke ermenîyan a din dide jibîrkirin. Eger mirov gotinên wê ç’avkanîyê jî bi bîr bîne, wê p’erdeya vir’ekî û şer’latanîya G. A. ya “zanistî” biçir’e.

Bixwînin û mat’mayî nebin: “Binecîyên wê cîhanê (ango – wî welatî. – K. M.), yên ku k’urd in, med tèn navkirin”. (Matênadarana Ermenîstanê^[7], destnivîsa № 1495, r’û.

142b û 142-an; t'emenê vê destnivîsê 400 sal e!). Li vir li ber ç'avan e, ku ermenîyan gotine “med”, “k'urd” têgihîştine, gotine “k'urd”, “med” têgihîştine. Em dibêjin, piştî ewqasî êdî şrove pêwîst nakin, û delîl û p'alpişt jî pêwîst nakin, ji ber ku, yên ku di vê cîhanê da bi cîartîya k'urdan û di nav k'urdan da jîyane, û k'urd ne bi gotinên hinekên dinê nas kirine, ermenî bûne. Ermenîyan jî heya sedsala şanzdan k'urd wek med û med jî wek k'urd nas kirine (û ji bo vê jî delîlên nivîskî hene!) ...

Lê di derbarê wê yekê da, ku G. A. bereka k'urdan a r'ojkî ya ermenîyan dihesibîne, em dihêlin ser wîjdanê wî yê “zanistî”, lêbes, dîsa jî minê bixwesta r'astîyê li ber xwendevanên xwe vekin. Di heman gotara xwe da (dibe ku, bêyî ku wê têbigihîje) ew bi xwe wê “t'êza” xwe vala derdixe, dema li r'ex p'eyva ‘r'ojkî’ di nav cotkevanan da dinivîse: “(her weha, ‘r'ûzakî’)”. – Divê bê gotin, ku p'eyva ‘r'ojkî’ ji p'eyva k'urdî ya ‘r'oj’ tê, şêwazên vê p'eyvê yên kevn jî: ‘r'oz’ an ‘r'ûz’ îro jî di hinek deverên K'urdistanê da hatîye p'arastin (em vê hemberî p'eyva farisî ya ‘r'ûz’ jî bikin, ango, ‘r'oj’). Û, eger G. A. dixweze p'eyva ‘r'ojkî’ bi navê malbata ermenîyan a “R'ştûnyan” va girê bide, wê demê divê ew di sêrî da îzbat bike, ku p'eyva ‘R'îştûnî’ ji p'eyva ‘r'oj (r'ûz)’ tê?!...

Bêç'aretîya G. A. û bêwat'etîya “t'êza” wî li ber ç'avan e!

Bi van “îsbatîyên” xwe yên vala, bi “meşa” xwe ya “r'edkirinê” va G. A. digihîje pîrsa ji hêla k'urdan va avakirina dewleta net'ewî, û “dide xwîn”, ku k'urdan di dîroka xwe da dewleta net'ewî ava nekirine... Eger ev yeka mirovekî bigota, yê ku bi ç'avkanîyên ermenîyan r'a nas nînbûya, mirov dikaribû ev yek, wek bêagahî û nezanîya vî mirovî bip'ejiranda. (Û li vir G. A. ç'avkanîyên ermenîyan li hêlekê hiştîye û çûye hewcê r'êwîger'ê t'irk Evlîya Çelêbî bûye. Dibe ku wî ji bîr kirîye, ku heman Evlîya Çelêbî di derbarê ermenîyan da jî nivîsye, lê divê em ne bi devê wî bi hevr'a biaxivin). K'urd, çiqas dewlet û mîrtîyên wan jî hebûne, her çiqas di welatê xwe da dagerkirî jî bûne, lê di welatê dagerkirî da jî t'ucar bêdewlet nînbûne. Her çiqas k'urd di bin bandora hinekan da jî bûne, ew bindestî bi şêwazî (şiklî) bûye, t'enê xerc dane û serbixwe mane. Û ew nîvserxwebûna wan jî bi destê berdestî û xulamokên serdarîya t'irkan hatîye t'unekirin (em dibên, G. A. divê di vê derbarê da ji bîr nekiribe, ji ber ku bi hemû hêza xwe va hewl dide, xeta wan berdewam bike). Ji bilî vê, wek ku tê zanîn, G. A. nikare, yan jî naxweze tê bigihîje, ku p'eyva ‘emîr’ bi k'urdî ye, ango, ‘mîr’, ‘p'adîşah’, ‘qral’, ‘şah’ (emîr<emîr < ê mîr), û her mîrekî k'urd xwe wek şahêkî (qiralekî) hîs kirîye.

Ji bo ku ev t'evlihevîya çêbûyî ji hev bê vebijartin û ava zelal bik'eve, dibe ku pêwîst bike, bi dehan p'irtûk bînin nivîsar. Lê em bi ewqasî t'êr bibin û li ser lêtymotîva siyasî a G. A. r'awestin.

Di beşê gotara xwe ya yekem da (“Azatamart”, № 26 (69)) di nav wê t'evlihevîyê r'a, ya ku wî bi xwe bi destê xwe çêkirîye, G. A. wê nêr'înê davêje meydanê, xwedêgiravî “k'urdên Başûrê Kafkasîyayê bi sekna xwe va t'imê bi mêla (t'angîrîya) adirbêcanîyan va k'etine ç'av, berovajî êzdîyan, “...ên ku di nava sedê salan da di mêla wan a berbi ermenîyan da t'u guhar'tin çê nebûye...” (Weha, ji bo çî ew ewqasî hewl dide, ji ç'ermê xwe dertê, ku “îzbat” bike, êzdî “ne k'urd in”! – K. M.). Helbet, tiştên weha ji bo me nû nînin, li ber ç'avan e, ku ew sparîşa hinek derdorên siyasî pêk tîne. Ewî berê jî di gotarên xwe da êzdî wek yekîneyeke êtnîkî ya ne k'urd a serbixwe dayê xuyanê, lê bi wê yekê heya di nav hinekên xalifî û ç'avtirsîyayî da jî helwesta dijber hişîyar kirîye. Û ji bo vê jî ev yek ji pisporê “êzdîbazîyê” xweş nehatîye, û ew berê xwe dide şêwazên nû yên bandorkirinê. Bi wan gotinan dixwaze bibêje: “K'urd dostên dijminên me ne (ango, ên adirbêcanîyan û t'irkan), û, ji bo wê jî, eger hûn xwe k'urd bibînin (an nav bikin) hûnê jî bik'evin r'êza dijminên me”.

Fermo, de bibêjin, eger ev ne t'êr'ora derûnî (psîkolojî) ye, lê çî ye?

Pey vê r'a bi vê germahîyê di beşê duyem da (“Azatamart”, № 27 (70)) G. A. berdewam dike:

“Naha jî çend goitn di derbarê wê da, k'a diaspora k'urdan, wek navenda bingehîn a amadekirina îdêolojîya net'ewî, hemberî ermenîyan xwedî çî helwestê ye.

Vê dawîyê, bi giranî jî piştî dagerkirina Laçînê, ewana hewl didin, bidine xuyanê, ku k'urdan bi xwezayî di derstpêkê da jî mêla ermenîyan kirine û, bi xwezayî, dijî t'irkan bûne. Helbet, ev ç'ir'ok berê jî dem bi dem dihate r'aberkirin, ew, xazma, p'ir' baş di çarç'eveya întêr'nat'sîyonalîzma lêp da bi cîh dibû".

Mirov li vir çî dikare bibêje? Ev gotina mirovekî ye, yê ku her tiştek kirye heşê xwe, û hewl dide bi her awahî wê bide p'ejirandin. Lê dîsa jî, ji bo xwendevanan divê hinek tişt bîn r'avekirin û r'onîkirin.

Berê pêşin, dagerkirina Laçînê çî têk'iliya xwe bi *întêr'nat'sîyonalîzma* navborî r'a hye? Naha demne nû hatine, yên ku bi gotarên yên weke G. A. tên makkirin. Û, ya duyem, divê hê mirov bikaribe îzbat bike, ku dagerkirina Laçînê di xewn û xiyala k'urdan da hebûye û k'urdan xwastine, ew pêk bê.

T'u kesek jî naxweze, ku welatê wî bê dagerkirin... Û hûrbînîyên here girîng di p'eydabûna vê gotara G. A. da, ên ku hemû derewên wî vala derdixin, ev in: gotara wî ya "Yên k'urd" 26-ê hezîranê destpê kirîye bê weşandin, em bibêjin, bila ew 10 r'ojan berê gihîştibe r'êdaksiyonê (+ -) û dîsa em bibêjin, ku wî ev gotar 10 r'ojan berî şandina r'êdakt'sionê destpê kiribe binivîse, bi vî awayî, 5-ê hezîranê dertê holê. Lê Laçîn 18-ê gulanê hatîye dagerkirin, û di Ewropayê da di derbarê wê da, em bibêjin, wê piştî r'ojekê-duyan agahdar bûbin. Lê r'êaksiyona dîaspora k'urdan piştî 9-10-ê hezîranê dîyar bûye (dema Daxuyanîya jinûva avakirina dewleta k'urdan hatîye p'ejirandin) û wana nikaribûn bi r'êya "felvekirina k'oç'ekan" pêşda têderxista, ku amadek'arîyên dagerkirina Laçînê tên kirin û piştî wê jî wê hewar-hêwarezeya asatiryanan destpê bibe, ku...

Li vir mirov dikare her tiştekî bibêje: *"Gelê k'rud dijminatîya xwe bi t'u gelî r'a jî nîne, gelê qenc û xirab nînin, hene r'êjîm û mirovên xirab, ên ku nanê xwe bi k'arê xwe yê k'irêt û gemar dixwun. Hema li ser van gotinên G. A. gotineke gelê r'ûs tê bîra mirov: "Her kes weke p'istîya xwe têdigihîje..."*

Weha, di bin bandor'a vê hewayê da li hemberî k'urdên Ermenîstanê helwestek tê amadekirin, a ku mirov nikare bi cûr'ekî dinê nav bike, eger ne wek hewla jênosîda (t'evkujî) derûnî. Û bi nêr'îna min, ev tiştên weha wê hê paşê berhemên xwe yên "pêwîst" bidin, eger mitaledarîya (r'ewşenbîrîya) ermenîyan bi xwe di nava xwe da qîmetekî nede van hemûyan (em bi bîr bînin, k'a cihanê piştî bûyerên Almanîyayê yên pey sala 1933-an r'a "berhemnên" çawa temkirin). Ji bo wê jî, ez, wek welatîyekî Ermenîstanê, deynê xwe yê mirovî dibînim, ku hemû alîyên van bûyeran ên r'eş û tarî r'onî bikim.

Di dema xwe da, dema hê nû lîstoka *"êzdîbazîyê"* dihate gur'dikirin, dema êrîşên derûnî danîn ser k'urdên êzdî, ku ew xwe, wek net'ew, ne k'urd hesab nekin, G. A. digot: "Îro weha pêwîst e, em weha dibêjin, sibê cûr'ekî din pêwîst be, emê tiştekî din bibêjin!"

Û ev lîstokên k'etî û k'irêt di nava civaka wan mirovan da, yên ku p'ir'î-hindikî haya wana ji dîrokê heye, pirsan derdixe pêş:

– Eger ev gelan dijmin bûne, wan çawa dikaribûye zargotineke hevbeş û hevpar bisêwirînin. (Binîhêr'in: "Êmînîyan azgagrakan joxovatsû"// "Berevoka êt'nograftî ya Êmînî" – bi zimanê ermenî!).

– Ew çawa ye, ku lawên gelê ermenî yên welatp'arêz û mezin bi hezkirineke mezin bi ziman, wêje, dîrok, çand û hunera k'urdan va mijûl bûne, yên wek Abovyan, Orbêlî, Îsahakîyan û Dêmîrç'îyan, Hraçîya K'oçar û yên dinê. Gelek t'êmayên (mijar) k'urdî ji bo afrandinên nivîsk'arên ermenî yên mezin bûne bingehe: H. Tûmanîyan destana xwe ya "Hildana kela T'imûkê" li Cavaxk'ê ji kalemêrekî k'urd bihîstîye, ç'îrokên Hr. K'oçar ên destpêkê bi mijarên k'urdî bûne, Komîtasê hunermendê mezin mijara dîploma xwe di Bêrlînê da li ser sazbandîya k'urdî nivîsye û p'arastye... û "Dilê yaman" straye, îro jî gelek stranên k'urdî di nav ermenîyan da tên gotin... Û ev xwezayî ye. Ew wisa xwezayî ye, wek ku em – k'urd jî, yên ku di nav ermenîyan da jîyane û dijîn, ji çanda wan bi bandor bûne...

Li vir êdî çî k'arê "întêr'nat'sîyonalîzma lêp" heye? Lê, ger di derbarê wê da bê gotin, divê bê zanîn, ku wê "întêr'nat'sîyonalîzmê" ewqas zîyan gîhandîye me, k'urdan, ku

negîhandîye t'u kesî. Di serdema vê "întêr'nat'siyonalîzmê" da bû, ku di Ermenîstanê da gunehên ku Împêratorîya Osmanîyan li hember gelê me û ermenîyan kiribû, dane bê, berê têk'ošîna gel ji armanca r'ast guhar'tin û k'urd kirin armanca, r'oj bi r'oj dilsarî kirin nava erdu gelên cînar û dost, r'oj bi r'oj r'ûp'elên dîroka herdu gelan ên r'onî hatin girtin û bûyerên bi destê dijmin û xayînan bi yekalî derxistin holê û kirin p'ara netewekê. Ma xayînen k'ê nînbûne û îro jî nînin? Ev tişt, ê ku îro tê kirin, gelo ne xayîntî ye?

Dîrokê van hemûya bidarizîne!...

Bi gotinekê, yê ku dîroka gelê me feş û lêp kirine, p'ir hebûne, û ew îro jî hene, yek kê, yek zêde – xem nîne. Dîsa jî em hêvîdar in, ku di Ermenîstanê da, ên ku wê pey vê xetê her'in, wê kê bin, her çiqasî jî yê weha îro bi helandayînen r'êxistinên siyasî hewayeke ne baş çê dikin...

Her çî jî hebe, tiştê ku dilê mirov şad bike, nîne: yê ku wê gotara G. A. bixwîne, wê di nav wî da hîsên t'evlihev hişiyar bibin û wê mat'mayî be û bi xwe jî ji xwe bipirse:

– Sert'aca nezanîyê ye ev, an bi bir'iyar xwe li r'êyek a nep'ak girtin e? Ê li ser wê r'êyê armancaek a nep'ak şopandin e? – Dibe ku herdu jî – bi hev r'a! Her çî jî hebe, dixwînê û naxwezî bawer bikî, ku di van r'ojên me da gotareke vê r'adeyê dikare p'eyda bibe, ew jî ya bi destê mirovekî hatibe nivîsandin, ê ku dixweze xwe wek xebatkarekî zanistê bide xuyan û di r'ojnameya partîyek a siyasî da hatibe weşandin!

– Gotara G. A. di nav xwendevanan da "wat'eya" r'oleke mêrxasekî mûltfîlma (film-karton) a "Maûglî" hişyar dike, ya ku bi t'êma ç'ir'oka R. Kîplîng hatîye k'îşandin:– "Eger têk'ilîyên hemûyan berbi başîyê va diçin, bê gotin, ew li yekî xweş nayê!.."

– A din jî, ku mirov mat'mayî dike, ew e, ku piştî gotarên weha helwesta r'ewşenbîrên (mitaledarên) ermenî p'ir' kê tê xuyan (heya sata t'unekî!).

– ...Propaganda dijminatîya net'ewî û net'ehmûlkirinê tê meşandin û "berhemên" wê (bila, piştî dehsalan be jî!) dê bigîhîjin.

– Gelo, yê ku wan berheman tem bikin, dê kî bin?

Korda Mad

Laçîn – Yêrêvan

Tîrmeh – 1992.

Nasî:

1. Binnûs – îmza, qol.
2. Lêgênd – efsane.
3. Lêp – feş, sexte, qelp.
4. Tîgranê Mezin – Tîgranê II ê mezin, padişahê Ermenîstanê yê sedsala I b.z. (s.s. 95-56, b.z.).
5. Înç'îç'yan û Lêo – dîroknasên ermenî yê sedsala XIX.
6. Mar – Ermenîyan pêşîyên k'urdan mad/medan r'a 'mar' gotine, ji welatê wan r'a jî-Marastan.
7. Matênadaran – Înstîtûta destnivîsên kevnar a Yêrêvanê.

Ev gotar di r'ojnameya "K'urdîstana azad" da (ya ku bi zimanên r'ûssî û k'urdî li Moskovayê r'onayî dibîbne), di hejmarên 7 (tîrmeha 2004-an) û 9-an (rêzber- 2004) da hatye weşandin.

Ç'avkanî: *kurd.press* – <http://kurd.press/?p=19940>